

Rîfrandum



Muhsin Qaçan

1

Li paşî vê rewşa nûya Îraqê çêbûy, ko Da's û hevpeymanên wê destê xo danaye ser Mûsil û gelek bajêr û bajêrkên di yên Sunnî, helweşîyana demlîdesta leşkerê Îraqê bê berevanî, ketina geleka çekî û parey didestê Da's da, hebûna valatîya asayşê li deverên Kurdîyên veqetandî û

ketina wan deveran didestê pêşmergeên Kurdistanê da, digelek semtan da deng bilind dibin, daxaza hikumeteka niştimanîya Îraqa êkgirtî diken, daxaza parastina yekbûna axa Îraqê diken, aya şîyana pêkhatina niştimanî, çêkirina hikûmeteka êkgirtî, parastina êketîya axa Îraqê, her weko bê hizirkirin û bi lucîkê dilînîyê e bangî heldidêrin, heya çi rade rastîyeke?

2

Di rastîya xoda çi Îraqên bi vî rengî û tuxîban di mêjûyê da nebûyne, li bin destê hikûmeta Osmanî sê wîlayet li şwîna Îraqê hebûyne (Besra, Bexda, Mûsil) weko tev wîlatên dî yên Osmanî.

Li pêkhatina rêkeftina Sîver li ber bûye dewleteka Kurdistanî bihête çêkirin û wîlayeta Mûsil ko 80% ji danştwanên wê li dwîv ser jimêrîya ('esbet alaumem almutehîde) Kurd bûyne, lê paşî dîtina petirolê li wîlayeta Mûsil, dewletên zilhêz (berîtanîya, Ferensa) nûjen hizir di pişkirina deverê da kireve bi rengekê ko çûna petirolê û desteserkirina wê jilayê wan ve misoger biket û tenahî li wê deverê qetlazî bîtin, parçeka dewleta Kurdî ya pêşnîyarkirî

daye tirkîya, êk bo Îraqê, parçek bo Surîya û parçek bo Îranê.

3

Îraq ji sê pêkhatên cudayên ne li gelêk guncayî pêkîna ji şî'eyên wîlayeta besra, Sineyên wîlayeta Bexda û Kurdên wîlayeta Mûsil. û bi zor destî desteka Sinî bi ser ptirîya vî welatê bi xurtî çêkirî sepand. bi rastî pêşbînî û merema kulnîyalîyê, ya Îraq pê çêkirî bi cih hat, tev kesên hatîne ser kursîka hukmî li Îraqê bi zihnîteka Erebîya koçerkîya cahîl karkirîye, zhnîyeta zirberhrkirina yê dî û talankirina malê wî û dagîrkirina axa wî, her ji ser demê Melikî Erebkirina axa Kurdistanê destpêkir bi rêka pirojê cih nişînkirina koçeran, milletê Kurdê axa wî hatîye parçekirin û dagîrkin, berevanî ji hebûna xokir û her ji serdemê şureşa şêx Mahmud û heya nihe agirê şureş û serhldanên Kurdan kiz nebûye.

4

Petirul berdewamî berev bazarên rojavayî çû û cobarên xwînretinê, wêrankirinê li Îraqê berdewam bû,



nedanpêdana desthelatdarên êk li dwîv êk li Îraqê bi mafên Kurdan, egerê şer û pêkdadanên wêrankerbûye di Îraqê da, xuh enîya mirovî digirît demê mirov bas li hovatiya desthelatdaran diket.

Li pêş çavên tevaya mirovayê jin, zaro, kal û cwan bi tevlihevî di gurên kom da nijandin, gund û wêrankirin, mizgeft sutin, av cik kirin, xelek bi xurtî mişext kir û talankirin, her êk ji van gunehan, ewên li dijî mirovayê dihêne hijmartin, têra hindê hebûye mirovayî xo liser nerazî biket, lê tev cîhan ya ker û lal bûye, heya ko di serhldana Kurdistanê da li paşî cenga gendavîya duwê, demê Kurdan Kerkok rizgar kirî û jêderên petirolê ketîne li bin metirsîyê, Emrîka rê û runahîya kesk da Sedamî, ko çek û hêzên xo li dijî milletê Kurd bikarbînît û mergesata kuça milîfunî encamê wê bûye.

Demê Sedam bûye gef liser jêderên petirolê li kendavî û li ser rijêmên hevpeymanên rojava, dinîya rabûve, û nerûnişt, êdî hingî hovatiya wî berçav kir, rîyê reşê wî dana ber tavê, qulp bo lêdana wî çêkirin, heya li sala 2003ê kirîyara rizgarkirina Îraqê hatîye gurê.

Kurdan her ji serhldana 1991ê rolê şarstanîyê xo nîşan da, lêborîneka giştî da û hewla lêburînê û pêkve jîyanê serhilda, li paşî 2003ê Kurd li hîvîya mizgînîya rojeka geş bûn jibo wê pêkhatîyê bi zurî, ewê navê wê Îraq, bi gîyanê lêborînê û pêkve jîyanê, bi destpêkeka nwî karkir, hewlda Îraqeka nûya dîmukirasî ava biken, ko mavê hemî hawelatîyan divî welatî da yê parastî bît, pişkdarî di nivîsîn û rîfranduma li ser desturê kir, sîngê vîyanê û dilînyê bo hemî pêkhatan vekir, lê heya ewên di tengavîyan da teraşên Kurdistanê lê bûyne xwedî û hêzên Kurdistanê hewandin, li jêr mejîyê şofînî mezhebî û çav bi serburahêmina serketîya Kurdan ranebûn pêalînk dane devera Kurdan bi merema paşêxstinê, destûrê nûyê hemîya nivêsi û deng dayê giruc kir û rawestand. bihizira wan xêzanên Kurda herwek sedamî ji cihên wan mişext kirin, bi hizaran Kurd bi satora hatine serjêkirin, bumbe û tiromblên TNT kirî peqandin, bê guman eve bi zanîn û handana deshelat û dezgayên sîyasî yên birayên mebûye ewên gurg di kevlê mîhan da, serve serve daxaza biraynîyê diken û dibinive şuvînî û mezhebîne. ne her eve bûye, çek kirîn, hêz çêkirin bi merema lêdana

Kurdan, herwesa hemî ser salan budcê Kurdistanê di xeyşand, û li dumahîyê erzaq birî, mûçe raustand, ev karên he kirîyarên dijî mafê mirov û mafên medenî ne, gunehin li dijî mirovayî ko îşaneka mezin bigehîne komeka îsnîya mirovan yan bi kirîyara birsîkirina wê komê rabît.

6

Her çende carnama gerduîya mafê mirovî û tev carname û pirotukulên dî da mîna mafî medenî mafê didene milletan çarenivîsê xu destînîşan biken, lê Kurdan, caran rê nebûye û caran jî ji heza pêkve jîyanê çî caran xu berev qetandinê nebirîye, lê li gel rewşa berdewama xo sepandin û hikumkirina bi agir û asna, helbûna fetîla cenga mezhebî, ewa berî li ser berî nehêlît, peydabûna hel û mercên cîhanî yên rêxoşker, herwesa yên navxoyî, necihê aqlîye milletê Kurd xo bihêlît pişkek ji Îraqeka dibinîyat da helweşîay, li ser çineyê çêkirî û rûbarên xwîna nehezîyê, şofînyê û mezhebî, careka dî bi dijwarî destpêkirî.

7

Di serbura kurta Kurdistanê da, Kurdan û

sîyasetmedarên wana girovekir, ko ne gefekn li ser çî welat û çî hêzan dîsan hebûna samaneke mezin daxa Kurdistan da, ava devê tev hêzên dinîayê di arînît, herwesa Kurdistan hêzên xu yên leşkerîyên rêkxistî hene, dam û dezgayên birêvebirina dewletê hene, ko berî niha tenê çîya li gel li heval bûyne, nihe hevalên mukumên çalak hene, heya ew dewletên berî nihe xo ji dewletbûna Kurdistan di tirsand mîna tirkîayê, ji egera ser hilbûna yek dû, karkirina li gel hevdû. niha ev tirse kiz bûye û ew serxobûna Kurdistan pesind diken

8

Dem delîveye. heko delîve hat û nehate bikarînan, delîve bi demve diburît.

Pêngava serok barizanî, pêngaveka aqlaneye ko rîfrandumê dinav Kurdistan da biket û liber runahîya wê pêngav bihêne havêtin û millet çarenivêse xo destînîsan biket.

Meguman nîne ko milletê Kurd dê bi erênî bersivê det, dê bi xwîna xo berevanyê jê ket, ev cîhane di encamên berjewendîyên xoda dê vê pêngavê pesnd ken û lê bin xwedî, evcar berev pêş... gîyanê me gurî axa welatê me bît.